YAŞA

**YA§A e.V.**

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات
والاستشارات القانونية

**YASA e.V.**
Postfach 7624
53076 Bonn

www.yasa-online.org

# Sûrî û guhartin… Çareserkirina doza kurdî

Ji nîvê meha Adara 2011-ê ve gelê Sûriyê li hemberî rejîmê serî hilda û doza demokrasî û rêzgirtina mafên mirov kir. Gelê Sûriyê li hemberî rêjîmekê ku ji nav welatên erebî ji xurtirîn rêjîmên çewisander e, serî hilda. Bersiva rêjîmê ji xwepêşandanan re vê yekê pesend dike. Gelek xwepêşandêrên ku doza azadî, demokrasî û rêzgirtina mafên mirov dikirin, hatin kuştin. Rewşa mafên mirov li Sûriyê pir kambax e. Nepeydabûna azadiya boçûn, derbirîn û ragihandinê û serdestiya komarê li ser alavên ragihandinê û çavdêreya li ser wan tev li Sûriyê peyda dibin. Herwiha gelek çalakvanên mafnas û rikber têne girtin û azarîkirin. Di van salên dawiyê de gelekan di girtîgehên ku mercên tenduristî û guhdana nojdarî tê de peyda nabin, jiyana xwe ji dest da.

Herwiha goriyên azarîkirinê bi rêjeyeke mezin di tevahiya jiyana xwe de ji ber pirsgirêkên derûnî û gewdeyî ji ber azarîkirina girtîgehê dinalin û hin ji wan ji ber azarîkirinê jiyana xwe ji dest didin. Tora alavên ewlekariyê û ajanên wê serdestiyê li ser jiyana rojane ya welatiyê sûrî dikin. Herwiha rê li ber rikberiyê girtî ye, ku di bin seywana desthilatdariya yekpartiyê de karê xwe bike, ji ber ku ji beriya pêncî salî ve vê rêjîmê her tişt xistiye destê xwe,. Herwiha binpêkirinên rojane yên mafên mirov mîna girtina nerewa, azarîkirin û wendabûna neçar ji hin kesên, ku nayên pejirandin, her hene.

Hindekahiyên netewî û olî ji bêtirîn goriyên çewisandina komarê ne, nexasim kurd. Kurd di Sûriyê de netewa didoyê ya mezin in û ji dehên salan ve pêrgî çewisandin û binpêkirinê tên. Rêjîma Sûriyê her demê xwestiye pirsgirêka kurdî bi siyaseteke nijadperest, pişaftin û erebkirinê bi dawî bîne. Rêjîm zimanê kurdî venanase, qedexe dike û nahêle, ku tu alavên ragihandinê bi zimanê kurdî hebin. Di sala 1962-ê de bi hezaran kurd ji nasnameyên xwe hatin bêparkirin. Ew û zarokên xwe ji mafên xwe yên bingehîn mîna mafê arziyê, xwendin, qeydkirina zewacê, hilbijartin, dengdan û karkirina di dezgehên komarê de bêpar bûn.

Herwiha zeviyên gelek cotkaran ji wan hatin standin û ketin destên hin ereban de, ku ji aliyê çemê Ferêt bi alîkariya rêjîmê hatin herêmên kurdî, da ku demografiya herêmê bête guhartin.

Armanca protestokirinên ku li Sûriyê dibin pêkanîna guhartina demokrat e. Ji ber vê yekê divê ev daxwaz bi cih bibin:

1. Rawestandina tundiya ku rêjîm di mafê welatiyên xwe de dike.
2. Rêdana derbasbûna rojnamevan û alavên ragihandinê yên biyanî, da ku wêne û bûyerên ku li Sûriyê dibin, bi zelalî ji raya giştî ya cîhanî re ragihînin.
3. Berdana hemû girtiyên siyasî.
4. Divê civaka navnetewî van kiryaran şermezar bike, ji ber gurkirin û arandina li Sûriyê dibe ziyanê digihîne aştiya cîhanî û hêrêmê tevî. Ji ber vê yekê ji Encûmena Ewlekarî ya Navnetewî tê xwestin, ku bi erkê xwe li gorî birê heftê ji peymana Netewên Yekgirtî rabe û biryara sezayên aborî û qedexekirina şandina çekan ji Sûriyê re bisîtne.
5. Ji Yekîtiya Ewropî tê xwestin, ku bi sertî li hemberî Sûriyê helwesta xwe bide û çi kesên alîkar ji rêjîmê re rawestîne. Divê şêwazê dan û standina Sûriyê û çewisandina wê ji gelê wê re bi awayekî neyînî li ser siyaseta wê bi Ewropayê re vegere.
6. Rakirina peymana vegerandina penaberan, ya ku Elmanya di gel Sûriyê naviş kiri bû û rawestandina dersînorkirina penaberan ji bo Sûriyê, ji ber jiyana wan dê bikeve metirsiyê.

7. Divê Elmanya têkiliyên xwe yên dîplomasî û hevkariya xwe di gel Sûriyê rawestîne û balyozê Sûriyê mîna kesekî jênehezkirî bête nirxandin û paşê ji balyoz bête xwestin, ku ji Elmanyayê derkeve.

Herwiha divê ev aramanên jêrîn bi cih bibin, da ku prosesa veguhastinê ji bo komareke demokrat, ku tê de mafên mirov bêne parastin, bête mirogerkirin:

- Pêkanîna proseseke çaksaziya demokrat, ku wekheviyê di navbera hemû kom û hindekahiyên netewî û olî di welêt de bi cihî bîne.
- Rêdana damezirandina partiyan û rakirina bûjena heştê ji destûra Sûriyê, ya ku di riya wê re partiya Baat her tişt kiriye arziya xwe û rakirina pergala yekpartiyê.
- Damezirandina encûmeneke niştîmanî, ku hemû çêkerên gelên Sûriyê bi wekhevî tê de beşdar bibin û danîna destûrekî demokrat, ku pirîtiya netewî û olî li welêt ber bi çav bistîne û azadiya boçûn, ragihandin, cihêkirina desthiltdariyan, parastina hindekahiyên netewî û olî misoger bike û mafên wan ên bingehîn venase. Div dengdaneke gelêrî li ser destûrê nû pêk bê, beriya ku bête erêkirin û rewakirin. Herwiha divê hin yasayên nûjen ji bo damezirandina partiyan û herwiha hilbijartinan bêne danîn. Divê pergeala desthilatdariya navendî bête rakirin û pergaleke federal bête danîn, da ku gelê Sûriyê xwe bi xwe û bi azadî kari be biryara çarenûsa xwe bide, ji bo pêkanîna pêşketina wî ya siyasî û çandî.
- Çareserkirina doza kurdî li Sûriyê bi awayekî demokrat li gorî rêmana mafê çarenûsî, ku di riya wî re xweseriyek xweser di çarçeweya yekîtiya welêt (Sûriyê) de bête misogerkirin. Ew jî di riya van xalan re bi cih dibe:

1. Misogerkirina beşdariya kurdan di jiyana siyasî û aborî de li welêt.
2. Misogerkirina mafê vegera her welatiyekî kurd, ku ji herêma xwe hati bû bidûrxistin.
3. Dayîna alîkariya aborî ji bo cotkarên ku ji arziyê xwe hatine bêparkirin û ji herêmên xwe hatine bidûrxistin.
4. Rakirina projeya kembera erebî.
5. Venasîna destûrî ji bo mafên siyasî û çandî yên gelê kurd.
6. Vegerandina nasnameya sûrî ji bo welatiyên kurd, ên ku jê hatin bêparkirin û ziyandayîna wan û misogerkirina hemû mafên wan ên şarewer.
7. Pêkanîna vegeşkirinê di herêmên kurdî de, yên ku ji ber guhnedana desthilatariya rêjîma Baas li paş mane.

**Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî-YASA .e .V**